


ETÎMOLOJIYA NAVLÊKA “MELE”





Ali Husein Kerim

Min, ji hin oldaran pirskir: koka navlêka “mele” ji kîjan zimanê ye? Hemûyan jî bersivên “tên zanîn” dan. Ango gotin bi Zimanê Erebî ye. Dibêjin ji peyva معلم (mûalim) ‘mamoste’ derbasî li nav Zimanê Kurdî bûye. “Mualim” tê wateya kesê ku fêrdike, zana dike uhw. Angoreyî ferhenga Proto-Samîkî navlêka mele ji peyva *wly* maye. Ji gotina *wly* du navlêk derketine¹:

- a. *Maulana, mullah*: mewla, efendî, hevalbend
- b. *Wilaye*: *vilayet*, desthilatdarî, herêm, rêvebirin

walādu [Û.TU : ] (*ūlid*) tê wateya ‘yê tîne dunyayê, dizê, çêdike’

Ev peyv angoreyî zimanên bi samîkî jî wisa ye:




- Proto-Samî: **walād*
- Erabî: *walada* 
- Sûrî: *īlād* 
- Hibrî: *yālad* 
- Ugarîî: *yld* 
- Ge'ez: *walada*

Gelo wisa ye, rastî jî navê “mele” ji Zimanê Erebî derbasî li nav Zimanê Kurdî bûye? Ji bo mirov piştrast be divê koka navlêka “mele” ji hêlekî di nav zimanên sumerî, samî û amoriyan de bigere; ji hê hêleke din ve jî berê xwe bide li curbicur grûhên zimanan.

Her wiha:

A) Bi goreyî zimanên samîkî “mele”

Sumeriya dema sulala Ur a III mîn *mala-* ‘keştî’, Babilîya kevn *ma₂-la₂*; *ġešma₂-la₂*; *gima₂-la₂*; *gima₂-la₂* ‘keştiya berkêş’.

[1]		<i>ma₂-la₂</i>
[2]		^{ġeš} <i>ma₂-la₂</i> (^{ġeš} <i>ma₂-la₂</i>)
[3]		^{gi} <i>ma₂-la₂</i>

¹ Bernice Varjick Hecker, The Biradical Origin of Semitic Roots

Sumerî *malah* ‘deryavan’; ED IIIb, Akkadiya kevn, Ur III, destpêka babbîlî ya kevn, *ma₂-lah₅*; *ma₂-lah₄*; *ma₂-lah₆*; ^{lu}*ma₂-lah₅*; ^{lu}*ma₂-lah₄*; ^{lu}*ma₂-lah₆* "deryavan"; Akk. *malahhu* ‘deryavan’

Jixwe ev peyv di kurdiya nûjen de wateya *melevan* ‘yên ku sobahî dikin, avjênîyê dikin’ tê gotin. Paşmaka peyva “*melevan*”a kurdî, navlêka *malah* ‘deryavan’ a bi somerî û horîkî ye.

[1]		<i>ma₂-lah₅</i>
[2]		<i>ma₂-lah₄</i>
[3]		<i>ma₂-lah₆</i>
[4]		^{lu} <i>ma₂-lah₅</i>
[5]		^{lu} <i>ma₂-lah₄</i>
[6]		^{lu} <i>ma₂-lah₆</i>

Sumerî *melim* ‘wurşedarî/ihîşam’; Lagaş II, Ur III; Babîla kevin *me-lim* "wurşeya tirsnak"

Akk. *melammu*.

me-lim₄ (me-lam₂)

Akk. *melammu* ‘biriqîna tirsnak’

Babîliya kevin *mallili* ‘miremir’, → *e-le-el* ‘starandin, klam gotin’; Akk.

→ *e-lil₂* ‘stran’

Sumeri *me*; Lagaş II, Ur III, Babiliya kevin *me₃*; *me*; *me₇*; *me₉*; *me_x*(AK×ŠITA); *me₁₁* "şer, ceng"

[1]		<i>me₃</i>
[2]		<i>me</i>
[3]		<i>me₇</i>
[4]		<i>me₉</i>
[5]		<i>me_x</i> (AK×ŠITA)
[6]		<i>me₁₁</i>

Summ. *me* ‘daxwaz’; Babiliya kevin *me* "daxwaz"

Summerî *lu* ‘kes, şexs’; ED IIIa, ED IIIb, Ebla, Akkadiya kevin, Lagaş II, Ur III, Babîliya kevin a destpêkê, *lu₂*; *mu-lu*; *mu-lu₂*; *lu₁₀*; *lu₆* "kî, kîjan; Akk. amêlu;

Akk. *malkum, malikum* ‘şêwirdar’ yan jî ‘şahzade’; Ass. Malû ‘tjî, dagirtî’

Peyva malā ‘tjikirin, dagirtin’:

- Proto-Samî **mala-*
- Arabiya kevn *mala’ a* مل
- Surî *mīa* ميا
- Hibrî *mālā* מלך
- Ugarîti : *mlā* tê wateya ‘tjikirin û dagirtinê.’

Eger em berê xwe bidin peyvên jorê yê curbicur:

Paradigma 1

1. Navlêka “mele” ji somerkî *melim* ‘wurşedarî/ihtîşam’ maye. Her wisa ev peyv ji somerkî derbasî li nav hemû zimanên rohilata-nezik bûye. Wateya wê ya niha “mirovê wurşedar” e.

2. Navlêka mele peyveke hevedudanî ye û bi hevedudaniya peyvên sumerî yê mîna *me* ‘daxwaz’ û *lû* ‘mirov’ pêkhatiye. *Me+lû*= melû ‘mirove ku daxwaz dike’, ‘ji kesî yan jî ji kesan tiştan dixwaze’.

Paradigma 2

Ji peyva **wly/walād* ya Proto-Samîkî derhatiye. Pêşpirtika bi erebkî “*mu*” ya ku lêker û navlêkan çêdike hatiye pêş û bûye *muwlad, muwla, mewla, mula, mola* û *mele*. Angoreyî vê peyvê, mele tê wateya kesê tîne cîhanê, kesî xwadîtîyê lê dike, kesê ku çêdike.

B) Bi goreyê zimanên Hînd-Ewropî koka navlêka “mele”:

Proto-Hînd Ewropî **melə* - ‘rengê tarî’, *meldh-* ‘xwandina dîrozana, tiştê Xwedayî’, **mo-* ‘mezin, grîng’, -, **melə* : **mlō-* ‘pêşketî, bi pêş ve hatî’, Horîkî *al-u* ‘kesê diaxife’; *magalti* ‘pêşkêşvanê ayînê’, Hîtîkî *ma-al-ta-i, mald-* ‘xwandina dîrozê’, *mal* ‘mirovê dijwar, şerrûd, jêhatî, zîrek’; *mallai* ‘pejirandin, selimandin’, Luwikî *malî* ‘hizir, pêşniyar, tewawkarî’, *mald-malda* ‘xwandina dîrozana, xwastek’; *malæašša-* ‘ayîn’; *malæaššalla/i* ‘pêkanîna ayîna efsûnî’ Litvanî *modla* ‘perestgeha pûtan’, *meldžiù, mēlsti* ‘dîroz û daxwaz’; Polonî *modla* ‘dîroz/dua’; Ermenîkî *malt’em* ‘ez dua dikim’ *meldon* ‘taybetkirin, diyarkirin’

Hîtîti: KUB 25.36 v 22.25:

Ta *ma-al-ti* *ḥattīli mān*^{LU} *GUDU ma-al-duwa-ar zinnizzi*

“û dema ku rahib xwandina dîroza bi Zimanê Hattî diqedîne”;

mollīō, mollīre, mollīvī, mollītum ‘sernerm, nefspîçûk’

ON (bakûriya kevn) *mála-* ‘axaftin, agahî, zanyarî’, Latîn *melius* ‘yê/ya çêtir’; miles, militis ‘serbaz’, melody ‘awaz’ jî dikeviv li nav vê kategoriyê.

Proto-Hînd-Ewropî **moladh-*, **m_oladh-* ‘serî, serdar, pêşkeftî’; Hînd-Îranî *murdhan-* ‘serî’, serdar’; Yewnaniya kevn *mlodh-rós* ‘bilindî, hilbijartî’, Tokhariya A *malto-* ‘despêk, sereta’

Ev nav û navlêkên jorê hemû jî taybetiyên meleyan destnîşan dikin. Mele di nav civakê de mirovên hilbijartî, serdar û serkêş in. Di rêza pêşîn de cih digrin. Pêşkeftî û maqûlên civakê ne.

Diyare peresena peyva PHE ** μ eik-*, ** μ ik-*, ** μ oiko-* ‘mal, gund, cihê seknê’ di zimanên Hînd-Ewropî yên nûjen de wiha pêkhatiye:

Ingilîziya Kevn *world* ‘hebûna mirovan, kiryarên mirovan’; EN *world* ‘cîhan/dunya’; ON (Bakûriya Kevn) *vereld*; Saksoniya kevn *werold*, Frîsiyana Kevin *warl*, Gothî *weihs* ‘gund’; Dutch *wereld*, Almaniya bilind a Kevn *welt* ‘cîhan/dunya’ jî Proto-German peyva **wer* ‘mirov’ derketine holê. Bi zimanê dêrê yê kevn ê Slavî jî *visi* gund e.

PHA ** μ eik-*, ** μ ik-*, ** μ oiko-* ‘mal, gund, cihê seknê’ di latînî de wek *villa* ‘gund’ cih girtiye. Heman peyv di Înglîzî, fransîzû hhd. de bûye *willage* ‘gund’.

Lûwîkî *walliyatt* (i) ‘bilindkirin, hilovanî’, Sanskrîtî *vit* ‘gundewarî, xwanî, cih û war’, Avesta *vis* ‘xwanî, bi medî û farisiya kevnar *witham* ‘xanî, gund, hoz’ peyveke pir balkêş e.

Heman peyv di Zimanê Kurdî de gelekî diyare û bûye *welat*.

Wisa xûya dike ku bingehê “*wilaye*” û “*mewla*” ya erebkî jî peyva PHA ** μ eik-*, ** μ ik-*, ** μ oiko-* ye.

Eger navlêka “*mele*” jî peyva erebî *mewla* derketibe jî, koka xwe ya destpêkê kurdî ye. Ji Zimanê Kurdî derbasî li nav erebî bûye û jî wir carek din vegeyriyaye hêlîna xwe. *Mele* tê wateya kesên rêvebirê cih û deverekî. Jixwe mele rêvebirê olî yên mizgeftan e. Ango ew rêvebirê yê mala Xwadê ne.

Biografi:

Alexander Militarev Russian State University for the Humanities / Santa Fe Institute Acomplete etymology-based hundred wordlist of Semitic updated:Items 1–34

Ali Husein Kerim, Hurriler-Khurritletler-Kürtler, Enstîtûya Kurdî ji bo Lêkolîn û Zanîst, s. 151, Almanya 2014

Ali Husein Kerim, Kürtçe Etimolojik Sözlüğü (Karşılaştırmalı), Enstituya Kurdî ji bo Lêkolîn û Zanîst li Almanya, 2014.

Ali Husein Kerim, Kürtçe Etimolojik Sözlüğü (Karşılaştırmalı), Weşanen Enstîtûya Kurdî ji bo Lêkolîn û Zanîst li Almanya, 2013

Arnaud Fournet & Allan R. Bomhard, The Indo European Elements in Hurrian, La Garenne Colombes, Cherleston, 2010

Benjamin Walker, Gnosticism, Its History and Influence, A concise survey of gnostic thought from its pre-Christian origins to its modern manifestations, The Aquarian Press, Wellingborough, Northamptonshire, 1983.

Bernice Varjick Hecker, *The Biradical Origin of Semitic Roots; Glossary of Akkadian*, I. J. Gelb, The University of Chicago Press, Chicago, Illinois, 1957)

Biella, J.C. *Dictionary of Old South Arabic*. Chico, 1982 Oppenheim, L., E. Reiner & M.T. Roth (ed.), 1956–. *The Assyrian Dictionary of the Oriental Institute, the University of Chicago* – Chicago

D. N. MacKENZIE, *A Concise Pahlavi Dictionary*, Oxford University Press, London, 1971.

Dennis R. M. Campbell, *Mod and Modality in Hurrian, Volume One*, s. 122, Chicago, Illinois, 2007

E. Laroche, *Glossaire de la langue hourrite (Revue Hittite et Asiatique, 34-35)* Editions Klincksieck, Paris 1980

Guiliano Bonfante & Larissa Bonfante, 2002. *The Etruscan Language. An Introduction*. Manchester

Guiliano Bonfante & Larissa Bonfante, *The Etruscan Language. An Introduction*, 214, Manchester University Press, 2002

H. G. Güterbock, *Kumarbi, Kumarbi, Mythen vom churritischen Kronos*, Zürich-New York, 1946

H. P. Blavatsky, *The Theosophical Glossary*, The Theosophical Publishing Society, 2006, U.S.A

Julien R. Fielding, *Discovering World Religions at 24 Frames Per Second*, Scarecrow Press, Inc. Amerika

Julius Pokorny,

Julius Pokorny, 302-4:1, *Indogermanisches etymologisches Wörterbuch*. 2 Bände. Francke Verlag, Bern und München (Bern/Stuttgart 1989), 2

Michel Jordan, *Dictionar of Gods and Goddesses*, 1941.

Militarev, A., 2005. Root extension and root formation in Semitic and Afrasian. *Proceedings of the Barcelona Symposium on comparative Semitic*, 19–20/11/2004, *Aula Orientalis* 23/1–2, p. 83–130.

Nevill Drury, *The Dictionary of the Esoteric*, Delhi 2004

Roshen Dalal, *The Religions of India: A Concise Guide to Nine Major Faiths*, Penguin Books India, 2006.

Sujit Mukherjee, *A Dictionary of Indian Literature: one Beginnings 1850*, Orient Longman Limited, New Delhi, 1999 University Press. Akt. Arnaud Fournet, *A Tentative Etymological Glossary of Etruscan* (article).

WP. II 289, 291, WH. II 20, Trautmann 177, Benveniste BSL. 33, 133 ff., Mudge Lg. 7, 252.